

Di roja cîhanî ya Azadiya

Nerfînan de ragihandina Rojhi-
lat hêj her di nav sînoran de ye!

»»» R:7




Tehran Yan Tilavîv,
Di Kîjan Baskî De
Şer Germ Dibe

»»» R:3



Pirsgirêkên psîkolojîkî yên
ciwanên Îranê û paşhatên wê

»»» R:4



Qamişlo û destpê-
ka rêkeftineke Rûsî-
Amerîkî

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (397) 07-05-2021 Buha (1000) Tûmen

Germkirina hilbijartinê bi şewitandina Zerîf

Senariyo û leyîzên
Spêş ji şanogeriya
hilbijartinan li Îranê di
bin deştilata Komara
Îslamî de bûne komek
leyîzên dûpatkirî û heta
çendpatkirî, rejîm bi
mifahwergirtin ji heşt
olî, navçeyî û eşîretiya
xelkê an jî mifahwer-
girtin ji faylên dengî ku
bikare fêlê ji xelkê bike
û wan bikêşe ser sindo-
qên dengdanê!

Di rojên derbasbûyî
de fayleke dengî ya sê
demjimêrî ya Cewad
Zerîf, binav Wezîrê
Derve yê Komara
Îslamî hate belavkirin
ku tê de basa midaxi-
leya Spaha Quds û ne-
maze Qasim Silêmanî
û herwisa beyta rêberî
dike, ku bertekên
Elî Xamineyî û cih-
girê Qasim Silêmanî û
çend karbideştên din
yên Spahê li pey xwe
anî.

Rêkevta 5`ê Bane-
merê, fayla dengî
ya hevpeyvîna “Mi-
hemedcewad Zerîf”
Wezîrê Derve yê rejî-
ma Îranê hate belavki-
rin, ku bas dike Rûsiye
di siyaseta derve ya
Îranê de bi hevkarîya
Spaha Pasdaran roleke
serke hebûye.

Navbirî di wê fayla
dengî de basa vê yekê
dike ku Spaha Pas-
daran û Rûsiye bo



têkdana rêkvevtina
Bercamê hevkarîya
wan hebûye û arman-
ca wan ji aliyekê ve
têkşikamndina hewlên
dîplomasî yên dewleta
Rûhanî bûye û ji ali-
yek din ve jî parastina
qazanc û berjwendiyên
xwe ji wê rewşa tev-
lîhev a aborî û siya-
siya ku niha Îran heye,
bûye.

Wezîrê Derve yê Îranê
îdia vê dike ku, ser-
dana Qasim Silêmanî
bo Rûsiye bi dax-
waza Rûsiyê û bi bê
çavedêriya Wezareta
Derve ya Îranê bûye,
çimkî pêka gotina
navbirî armanca wan
eva bûye ku destkev-
tên Wezareta Derve ya
Îranê ji mijara Ber-
camê têk bidin.

Pêka gotina “Zerîf”,

Rûsiya tev hewla
xwe daye ku Bercam
negihe bi encamê û
belgeyên bo vê îdia wî
jî eva ye ku Rûsiye di
rêûresma piştî wa-
jokirina Bercamê de
amade nebûye.

Li gorî gotinên Zerîf,
givaş û midaxileya
fermandê berê yê
Spaha Quds a terorîst
bi êşkere dîplomasî
goriyê meydana şer
kir.

Gelek bikarhênerên
torên civakî bi ax-
avtinên Mihemedce-
wad Zerîf bertek nîşan
dane û basa vê yekê
dikin ku belavbûna
wê fayla dengî bi
zanebûn e û devedevê

hilbijartinan e û bi vê
mebestê piropageendê
bo du aliyên Tundajo
û Miyanero di Îranê
de dikin da ku xelkê
bikêşînine ser sindo-
qên dengdanê.

Berê jî di sala 1398`an
a Rojî de fayla dengî
ya hin berpîrsên Spaha
Padaran hate belavki-
rin, di hilbijartinan sala
1392`an a Rojî de
herwisa bi vî awayî
fayla dengî ya Qalîbaf
hate belavkirin, wan
rojan jî fayla dengî ya
Zerîf hate belavkirin,
eva jî bi wê mebestê
ye ku xelk li cem wan
ew heste diruşt bibe ku
cudahiyeke di navbera
aliyên Binajoxwaz û
binav Rêformîst de
heye.

Berteknîşandana Elî
Xamineyî ji vê yek,
derxerê xaleke girîng

e ku di rejîma Îranê de
yê ku biryarê dide tenê
Elî Xamineyî û beyta
rêberî ye û Serkomar û
Wezîr di Îranê de tenê
cîbicîkerê fermanan in.

Bigiştî em dikarin
bêjin ku belavbûna
fayla dengî ya Zerîf du
rehendê sereke ji mi-
jarê bo me rohn dike;
Yekem îsbatkirina vê
raştîyê ye ku di çarta
rêkxiraveyî ya Ko-
mara Îslamî de ti post
û pêgehek bi bê îzn û
biryara şexsê yekem
ne tê danîn ne jî di-
karin raya xwe nîşan
bidin, û duyem jî, eva
fêl û lêbên rejîmê ye
bo xweşkirina tendûra
hilbijartina bê ya
Serkomar û Şewereyên
gund û bajar ku di vê
navberê de kesên wek
Cewad Zerîf dibe bête
şewitandin.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Şerê bi nûneratî an şerê bi wekalet, ew şer e ku Komara Îslamî ya Îranê têde perwerde bûye. Li destpêka hatina serkar a wê ku wa hizir dikir bi hêza îdolojîkî ya “Wilayeta Feqîh” a Spaha xwe dikare ji Tehranê ve heta Kerbelayê û ji wir ve jî bigihe Qudsê, û şerê kavilker ê digel Îraqê destpê kir, lê piştî şikesta bêrûmet ku Xumeynî bi firkirina cama jehrê binav kiribû, êdî xwe raşteraşt li şer neda û hînî vê yekê bûn ku hêzekê ava bikin û xulam û teslîmbûyî û kopalbideştên din xwedî bikin û wan bona şer û afirandina fitneyan bo deverê bişînin.

Di vê pênavê de jî, bi tenê ji girûpên Şîeyan razî nebûn û di raştî de ji Şîe û Sunniyan ve bigre heta Kiriştîyan û komonîstan, girûpên mafiyayî ava kir û li cihên cuda de, ji Lubnan û Sûriyê ve bigre heta Yemen û Behrênê û heta Îraq û Tîrkiye û Kurdiştanê jî, şerê xwe bi wan da kirin.

Di 1ê Gulana sala 2021an de, girûpeke tundajo a ser bi rewta cîhadî di şevê de êrîştî ser mal û jiyana xelkê sivîl li taxa “Darsêran” a Merîwanê kir û piştî xisarlêdaneke zêde bi mal û darayiya xelkê, 2 kes jî bi dijwarî birîndar kirin û xwestin rewşeke bi sam û tirs di nav bajar de biafirînin. Piştî ku wan ew erkê ku bi wan hatî spartin cî bi cî kirin, terorîstên DAÎŞê çûn û hêzên hovane yên Spaha Pasdaran jî li kolanan de hatine belavkirin û xwestin ku zêdetir rewşê tirsinaktir bikin.

Hekî ciwaneke Kurd kêmekê bêhna têkoşana medenî û

Desteke xuya



siyasî jê bê û wisa nîşan bide ku hizreke şoreşgerane û netewî heye, hemû dezgehên tepeserker ên Komara Îslamî ya Îranê li pey dikevin û binçav dikin û îşkence dikin; Ew cihê pirsyarê ye ku girûpên tundajo û girêdayê rewta cîhadî bi şewaza “Elqaîdê” û DAÎŞ li Kurdiştanê de bi azadî digerin û li mizgevtan de têne xuya ku li piraniya bajarên Kurdiştanê de kom dibin û hin caran jî manorê bi hêza xwe ve lêdidin û demûdezgehên Komara Îslamî jî çavên xwe digrin!

Di demekê de ku kesên pêle bilind ên Elqaîdê çendîn sal e di Îranê de dijîn û kesên binavûdeng ên wan li bajarê Tehranê ji aliyê Amerîka û Îsraîlê ve têne kuştin, êdî bersiva pirsyaran rohn dibin ku ew kes bi nav û rûkê tunajoyên Îslamî ve hatine rêkxistin, heta ku şerê bi nûneratî bo Spaha Pasdaran bikin.

Renge ew pirsyare bê kirin ku Spaha Pasdaran bi xwe û dezgehên îtila'at û bi 10an dezgehên tepeserker ku li Kurdiştanê de hene, hemû li çarçoveya sîstema serkutker a Komara Îslamî ya Îranê de dixebitin û netewa Kurd serkut dikin, êdî hebûna wan girûpane bo çî ye?

An bi wateye din, dema ku dezgehên “Wilayeta Feqîh” bi xwe şerê raşteraşt li dijî Kurd dike, êdî ti hewcehiyek bi şerê nûneratîyê heye? Birsiva vê yekê eva ye ku rejîm bi hemû demûdezgehên xwe yên serkutker ve, ne bi tenê nekariye hizra şoreşgerî û netewî di Kurdiştanê de bêhêz bike, belkî civaka Kurdiştanê niha ji dehikên derbasbûyî zêdetir ber bi nasnameya netewî û xebata mafxwazane ve diçe û Komara Îslamî ya Îranê dixwaze toyê neresenatî di civaka Kurdiştanê de biçîne heta ku bikare hêz û potansiyelan bixelitîne û hêza kopalbisdet û bê mejî hebe ku li şer digel hizra netewî û azadîxwaziyê de bikar bîne. Divê rişeya wan tundajo û terorîstan bi dijejemarkirin bê paqijkirin.

Tehran Yan Tilavîv, Di Kîjan Baskî De Şer Germ Dibe



N: Serbest Urmîye

Demek e ku qala hegera serhildana şer di navbera Îran û Îsraîlê de germ e. Nemaze piştî êrîşa meha borî ya Îsraîlê bo ser navenda lêkolîn û berhemanîna enjîniya navîkî ya Netenz a Îranê. Helbet êrîşa han destpêka pîrsgirêk û aloziyên di navbera herdu aliyan de nine û dawîya arîşeyan jî nabe.

Di rastî de ya ku vê dawiyê de pitir dewleta Îsraîlê hay dide meydana şer, metirsiya hilgirtina krîzên aborî ye li ser Îranê û valakirbûna destê rejîma Îranê di herêmê de xurtkirina destek û taqimên şerajo yên girêdayê Spaha Quds a Îranê ye. Lewma arteşa Îsraîlê serbarê vê çendê ku îd'ia dikin ku hewil didin bi êrîşên xwe bo ser bingehên leşkerî û cibilxaneyên Spaha Quds di nava axa Sûriyê de, pêşîya şer bigirin, lê dîsan jî pîlanên hegera serhilana şer tevî Îranê jî dişopînin.

Di vî şerî de!

Heke li gor gefên ku herdu aliyên şer wate rejîma Îran bo nehêştina Îsraîlê ser xarîteya cihanê û Îsraîl hîloşandina rejîma Îranê ji hev dikin, şerek biqewime, aliyên şer dê çawan li ber hev bidin?

Aliyê Îsraîlê ku hevalbendê eke bihez a Emerîkayê ye di Rojhilata Navîn de û ji bilî bihêzbûnê di warê teknolojiya şer de, piştî xwe daye piştevaniya madî û teknîkî ya Emerîkayê û hevalbendên wê di herêmê de. Bi xasmanî ku di sala borî de arîşeyên xwe bi hin dewletên Erebbên herêmê, ku pîranî rejîma Îranê weke gef li ser tenahiya



xwe û herêmê mêze dikin, bi dawî anîn û pireke aborî jî di navbera xwe û hijmarek ji wan re ava kir. Ji aliyê din ve ya ku heya niha hatiye mêzekirin, dewleta Emerîkayê heta di dema serokatîya Obama de jî ku bi rejîma Îranê re lihevhatin wajo kir, amade nebû bi mercên Îranê yên li dijî Îsraîlê razî be û Îsraîl bi teknolojiya dijemûşekî bi hêz kir. Di heyamê serokatîya "Donald Trump" jî derbasî nava "CENTCOM"ê hate kirin.

Niha di hegera serhildana şer tevî rejîma Îranê de "CENTCOM", wate navenda fermandariya Rojhilata Navîn, rojhilatê Efrîqayê û herêma Asiaya Navîn ya arteşa Emerîkayê, mafê vê çendê dide Îsraîlê ku hewcehî û alîkariyên xwe yên leşkerî û ewlekariyê, him ji hêzên Emerîkayê yên li herêmê û him jî ji hevalbendên wê re dabîn bike.

Aliyê din yê meydanê rejîma Îranê ye ku piştî hîloşîna rejîma Be'is li Îraqê û serhildana Bihara Erebbî li Sûriyê, derfeteke zêdetir peyda kir ku xwe nêzê sînorên Îsraîlê bi cih bike. Bi awayekê ku mirov dikare bêje her çar kinar jê girtin. Lê stratejiya Îranê di wî şerî de balkeş e.

Îran baş vê yekê fêm dike û xwe ceribandîye jî ku ji aliyê teknolojiya şer ve nikare li navenda Tehranê hevrikiya teknolojiya şer a Îsraîlê bike. Mînakê herî berçav avêtina mûşekên du salên bihorî bû ku hin ji wan axa Îranê jî derbas nekirin. Lewma hewil dide ku agirê şer di welatên cîranên Îsraîlê de geş bike û bi damezirandin, piştevanîkirin û tekûzkirina taqimên şerajo yên girêdayê Spaha Quds, teknolojiya xwe ya şer bibe ser yan nêzik sînorên Îsraîlê. Bo vê mebestê jî di hewil de ye ku wiha derkeve:

Li Lubnanê:

Weke tê gotin Hizbulaha Lubnanê bedeleke bihêztir dixuye di şerê Îsraîlê de. Li gor ku hatiye texmînkirin bi piştevaniya rejîma Îranê ye ku ew bûye xwedî 100 hezar mûşekên dûravêj ku dikare di dema serhildana şer de, derbeyeke giran li Îsraîlê bide. Di vê derheqê de "Nicholas Blanford" şarezayê pîrsa Hizbulahê dibêje ku di hegera serhildana şer di navbera Îsraîl û Hizbulahê de, Hizbulah dikare derbeyeke mezin li Îsraîlê bide û texmîn tê kirin ku kuştîyên şer ji yên sala 1948'an pitirtir be.

Li Sûriyê

Spaha Quds a rejîma Îranê bi alîkariya Hizbulaha Lubnanê, li ser navê paraştina tirba pêşewayên olî yên Şî'e li Sûriyê de taqîma Mudafi'ê Herem damezirandin ku pêk hateya wan şî'eyên Îran, Efxaniştan, Pakîstan, Îraq, Sûriye û Lubnanê. Sergêriya vê taqimê navenda leşkerî ya bi nava "Îmam Husên" li Tehranê dîku ku fermandehiya vê kesek bi nava Husên Hemedanî/ li gor gotinên Hemedanî taqîma han di çarçoveya 48 girûpan û 128 desteyan pêk tê ku di Sûriyê de şer dikin û 130 hezar besîcên Îranî jî bi amade hatine kirin ku biçin Sûriyê.

Li Îraqê

Damezirandina taqîma Heşda Şe'ibî ku yek ji bihêztrîn taqimên çekdar di Îraqê de tê hijmarkirin û herwiha tekûzkirina wê taqimê bi mûşekên dûravêj û balîstîk weke "Fetih 110", "Zilzal" û "Zulfeqar" û di heman demê de veguhaştina teknoloji, zanîst û hewcehiyên berhemanîna mûşekan bo taqîma han, aliyên pîrsa şer aloztir dike. Ji aliyê din ve dana balafirên bê pîlot bi wê taqimê li Îraqê de, gefên mezin li Îsraîlê dixwe.

Li Yemenê

Di Yemenê de bi piştevanî û dewlemendkirina cibilxaneyên şer yên taqîma Hûsî, rejîma Îranê hewil dide ku di hegera serhildana şer de, di çeperê Hûsiyan de jî şer li dijî Îsraîlê hebe. Herwiha bi dabînkirina kereşteyên mûşekan û balafirên bê pîlot, gefan li Îsraîlê dixwe. Li gor danezanîna heftenameya "Newsweek" a Emerîkayî, dana balafirên bê pîlot ên cora "Şahid - 136" dikare ji milê Yemenê ve jî êrîşî Îsraîlê bike.

Di rastî de rejîma Îranê hewil dide ku di hegera serhildan şer de, hemû herêmê ji şer bialîne û cehnema ku bi xwe tê dikeve, derdor jî tê bikevin.

Pirsgirêkên psîkolojîkî yên ciwanên Îranê û paşhatên wê



N: Behzad Qadiri

W: Behzad Simko

Tendiruştiya derûnî an psîkolojîk, an ku mirov bikare ji şîyanên xwe mifahê werbigre û pêwendiyê baş digel kesên din hebe, di raştiyê de tendiruştî şiyana jiyanêke bê diwariyên giran e, di cihanê de girîngiyeke taybet heye û lêkolînên zêde li ser tene kirin; Di wê gotarê de emê dê bas li ser tendiruştîya psîkolojîkî ya ciwanên Îranê û herwisa paşhatên wê yên girîng bikin.

Serokê Encumena Psîkolojîkî Îranê gotiye: “Nêzî %30 a ciwanên Îranê pirsgirêka hundirî hene lê, ew bi wê wateyê nîne ku ew %70 a din rewşa psîkolojîka wan baş in”, herçiqas li ti warekê de em nikarin pişt bi wan amaran girê bidin ku rejîma Îranê û rêxiravên girêdayê rejîmê belav dikin lê di heman halê de jî ew amar wê krîzê didin xuya.

Encama lêkolîneke li Îranê daye xuya ku berbelavtîrîn nexweşiya psîkolojîkî li nav ciwanan de, xemokî ye. Serokê Navenda Lêkolînên Wezareta Werzîş û Ciwanan gotiye, ku xemokî an depresiyon li nav keçan de zêdetir e, mijara depresiyon an xemokî li nav ciwanan de girîngiyeke zêde heye, ber wê yekê ku depresiyon bingeha piraniya pirsgirêkên din ên psîkolojîkî û reftarî û civakî ye.

Pêka heman lêkolînê, beşa ciwanan li xemokî de %3.1 e, piştî wê yekê nexweşiyên din ên psîkolojîkî yên ciwanên Îranê pêk hatiye ji: “Şerxwazî %2.9, Paranoîd %2.7, Weswese %2.4, Hes-tiyarî li pêwendîgirtin digel

keseke din %1.9, Perîşanî %2.1 û Tirs %1”, lê bi alxahînî ve rêje ji wê yekê gelek zêdetir e ku ti basek jê nakin.

Li wê lêkolînê de, cudatiyeke wiha li navbera kur û keçan de tinîne lê, keç ji kuran zêdetir tûşî xemûkî an depresiyonê dibin û ku jî zêdetir ji keçan tûşî Paranoîd dibin. Pêka amaran, duyemîn nexweşiya berbelav di Îranê de piştî nexweşiyên dil û demaran, nexweşiyên psîkolojîk in. Pêka gotinên Serokê Encumena Psîkologên Îranê, rewşa aborî û civakî, karlêkeriyeke zêde li ser zêdebûna nexweşiyên psîkolojîkî hene.

Civaknas jî li ser vê bawerê ne ku zêdebûna panîk, depresiyon, xwedûrgirtin, şerxwazî, û reftarên dijî civakî, li piraniya mînakên de ji pirs û pirsgirêkên civakî ve tên.

Sepandin û zordariyên civakî û aborî bo xistina kesên li çarçoveyê diyarîkirî ya îdeolojîk de, yek ji girîngtirîn sedemên têkçûna balansa hundirî ya mirovan e. Weke mînak, piraniya keç û jinan di Îranê de neçar in ku li derveyê malên xwe “Hicaba îslamî” hebin û yasayên pêwendîdar ku bi zordariyê ve li ser wan hatine sepandin bi rê ve bibin û bi wateyek din, neçar in ku wê rewşê qebûl bikin.

Xwekujiya ciwanan di Îran û Rojhilatê Kurdistanê de Nexweşiyên psîkolojîkî dema ku diwartir dibin, paşhatên wekî xwekujiyê hene. Amarên fermî yên rejîma Îranê bas ji wê yekê dikin ku rêjeya xwekujî li nav ciwanan de zêde bûye û pêka wê amarê, kesên ku hewla xwekuştinê didin, temenê wan kêmtir bûye û bi çendîn şewazên cuda û ecêb, xwe dikujin. Şewazên ku ciwan bona xwekujiyê bikar tînin her bi xwe bûne pirsgirêkeke hizrî yên nû li civakê. Ew bi darliqandin li cihên giştî û xwe avêtin ji bilindahiya bînanan



û pîrên ser şeqaman û ... xwe dikujin.

Lê çima ciwan li temenê buhara jiyana xwe de hewla dawîanîn bi jiyana xwe didin û xwe dikujin?

Rêxsisrava Tendiruştîya Cihanê li Amerîkayê gotiye: “Xwekujî, 13emîn sedema mirin li cihanê de ye ku girûpên temenî yên 15 heta 34 salîyan li cihanê de li xwe digre. Li her 40 çirkeyekê de kesek li cihanê xwe dike, lê temenê xwekujî li Îranê de heta bo asta dersxawanên destpêkî û navendî jî daketiye.

Pêka amarên pizîşkî yasayî û Wezareta Tendiruştî ya rejîma Îranê, li sala 1397 a Rojî de, rêjeya xwekujîya ciwanan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de %20 bûye, ev amara gelek bi sam e, piraniya wan ciwanan ku hewla xwekujiyê didin, li asta xwendîgehên destpêkî û navendî de ne.

Li derheq xwekuştina li nav ciwanan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de, em dikarin îşare bi wan xalan bikin: “Nexweşî û aloziyên pêwendîdar bi tendiruştîya psîkolojîk, panîk û xemokî, guherînên genetîkî, krîza balixbûnê, guherînên hormînî, nexweşiyên asayî û janên ji aştederketî, lawaziya bawerî bixwe neman, seha bêhêvîti, krîza nasname û xwenasîn û aloziyên li warê cinsî de û ...”.

Yek ji girîngtirîn sedemên xwekujîya li nav ciwan û

nûciwanana de, pirsgirêka civakî û nebûna berçaviyek ji paşerojê ye. Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ku di bin desthilata rejîma Îranê de ye, bi milyonan ciwan ti hêviyek bi paşerojê nînin û paşeroja karê wan rohn nîne, ji aliyeke din ve jî, hemû azadiyên wan jê hatine şandin û îdolojiyeke hişk û paremayî li ser de hatiye sepandin, lewma bilindbûna rêjeya xwekujî li welateke wiha de, dûr ji çavniheviyê nîne.

Her rojê, 300 ciwan û nûciwan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de tûşî madên hişber dibin.

Organa Rêxiravî ya Ciwanên Îranê bi belavkirina amareke cergbir bi tûşbûn bi madeyên hişber ragihandiye, ku milyonek kes ji wan tûşbûyan, temenê wan di bin 19 salî de ye û temenê tûşbûn bi madên hişber gihîştîye bi 13 sal.

Pêka nûtirîn lêkolînan, rêjeya tûşbûn bi madên sirker ve digere li ser 2 madên hişber ên ku ji nû ve derketine ku “Kirak û Şîşe” ne, bi awayekî bi sam li rewşa bilindbûnê de ne. Pirsgirêkên civakî, nexweşiyên hundirî li pey xwe tînin, û nexweşiyên hundirî dibine sedema xwekujî û tûşbûn bi madên sirker, lê bi kurtî, sedema bingeîn a bilindbûna wan hemûyan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de, desthilatdariya bi 40 salan a rejîma axûndî ya Îranê ye ku hemû aliyên jiyana xelk xistiye bin karlêkeriya nerêniya xwe de.

Bavê Tevgera Netewa Kurd, Mîrê Botanê “Mîr Bedirxan”



N: Keyhan Mihemedîniyad

Di destpêka wê gotarê de ez dixwazim bi mînakekê dest pê bikim. “Rûdiyard Kîplîng” nivîserê birîtani dibêje, “hekî dîrok wekî çîrokan bihatiba gotin û dersdan, ti carî nedihate jibîrkirin”.

Ew axavtinê “Rûdiyard Kîplîng” rast e, çimkî dîroka me Kurda jî tim ji aliyê dagîrkerên Kurdiştanê ve bi awayê çewt hatiye nivîsîn, û ya ku niha bo me maye ji aliyê çîrokbêjan û dengbêjan ve sing bi sing hatiye gotin da ku kesên welatperwer û dîroknivîsên nîştimanhez anîne li ser pirtûkan û nivîsîne.

Min jî ew zaniyarên ku li ser mîr Bedirxan berhev kirine ji çendîn çavkaniyan û pirtûkan mifah wergirtiye, her lewma min îşare bi çî çavkaniyekê nekiriye.

Bedirxanê Evdalxan an jî Bedirxan Beg kurê “Ebdullah Xan”, di sala 1803’an de li bajarê Cizîra Botan yê ser bi Bakurê Kurdiştanê hatiye dinê. Lê belê nêrînên cuda hene li ser jidayîkbûna mîr Bedirxan. Hin dîroknivîs jî dibêjin mîr Bedirxan di navbera sala 1803 heya 1806’an de hatiye dinyayê.

Bedirxan Beg ji Malbata Ezîzan bû. Şerefxan Bedlîsî di Şerefnameya xwe de nivîsiye ku malbata Ezîzan berê Êzîdî bûne piştî bûne Bisilman. Mîr bedirxan di sala 1830’î de îdara Botan xistiye destê xwe. Bi mîrê soran Mîr Mihemed re tifaq çêkiriye. Mîr Bedirxan pêwendiyekê baş digel Ermeniyên hebû û herwisa biryar dabû ku her kesek jineke Ermenî bixwaze dê alîkariya wî



bike. Xortên Ermenî jî di nav hêzên mîr Bedirxan de beşdar bûn û hêzeke baş pêk anîbûn. Mîr Bedirxan çendîn şewirmendên Ermenî jî di nav spaha xwe û derdorên xwe de danabûn, yên wekî “Dumiştîhan Mankoliyan, Ucansî Şalkitrîn û Mîrmarto”.

Carekê mîr serdana dibistanekê dike û ji mamosteyan re dibêje: “Her dersxwanek navbera rûpelekê bi bê şaşî bixwîne ezê paşayetiye bidimê”. Li wir derdikeve ku tenê mebeşt mîr eve bûye ku wan han bide ku baştir bixwînin û serkevtî bin. Ji bo di warê leşkerî de bibin pîspor û zaniyariya modern hîn bibin, gelek xortan dişîne Ewropayê.

Mîr Bedirxan gelek xizmetên baş bo gelê xwe kiriye, di dema desthiladariya mîr Bedirxan de, ne tenê dadperwerî û vekheviyeke baş hebû, lê belê kesên diz û gendel jî nebûn.

Mîr Bedirxan di dema xwe de 2 kargehên berhem anîna “çek û barot”ê li Cezîrê çêkiribû.

Mîr Bedirxan “dirav” jî bi navê xwe lêda, ji aliyekê nivîsibû “Emîrê Botan Bedirxan” ji aliyek din jî nivîsibû “1258’î Koçî”. Mîr karîbû xelkeke zêde bo aliyê xwe ve bikişîne û her kesekî jî ku tawanek kiriba bi tundî ceza dida û her kesê jî dizî bikiriba dest wê/wî

dibirî.

Zevî bi erzana dida çandin-karan bi rêjeya %3 dahata wê astê didane Mîr Bedirxan, ku ew aste jî li dahata ku dewleta Osmanî li cotkaran werdigirt gelek kêmtir bû. Mîr alîkariya malî dida wan kes û malbatên kêmdahat û destkurt. Her ji bo wê jî kêfa xelkê gelek bi mîr re dihat. Şewaza fermanrewayiya Mîr Bedirxan ev hinde tund bûye ku, tenê kesek jî bo mînak wekî diz û gendel ji sînorên mîratiya wî de xuya nekirine û cihê wan di mîrgeha wî de nebûye. Di dema desthiladariya mîrê Botan de, ewlehiyeke baş hebûye. Di wê demê de du Amerîkayî yên “gerîde” yên bi navên “Rasîst û Birat” çûbûne wê deverê û serdana deverê kiribûn. Çar hefteyan li wir mabûn û rastê ti arîşe û pîrsgirêkekê nehatibûn. Û herwisa dîtibûn ku xelkê wê deverê û serokeşîre çiqas dilsoz û hezkirîyê mîr in û hertim diyariyên wekî hesib û pez û malatan bo mîr wekî xelat birine.

Dadperweriya Mîr Bedirxan di navbera ol û mezheban de hebûye û hertimî hewil daye bo dadperwerî û vekheviyê di navbera hemû kesekê de. Dema ku spaha Osmaniyan mijûlê şerkirinê digel dewleta Misrê bûye. Mîr bi derfeteke baş zaniye û desthilata xwe berfireh kiriye û bo serxbûna Kurdiştanê li Mokriyan heya Botanê kiriye di bin desthilata xwe de. Di warê yeksanî û dadperweriya Mîr Bedirxan de,



“Mîr Celadet” mînakekî wiha aniye û gotiye: “Rûbarek hebû navê “Çem Cihû” yan jî rûbarê “Cihû” li nêz Cezîreyê “Îbin Omer” bûye. Cihûyan ji bo rêûresmên Olî û bo bi cihanîna wacibatên Oliyên xwe diçûne ser wî rûbarî. Û Kurda jî diçûn û rêya wan digirtin û dijayetiya wan dikirin. Rojekî “Xa Xam”ê Cihûyan diçe bal mîr û şikayet dike û bi dest îşare bo wî cihê dike, lê navê wî nayêne. Mîr pirsyara navê wî cihê lê dike, lê “Xa Xam” dîsan navê nayêne û her bi dest îşare dike. Di wê demê de Mîr pê dikene û jêre dibêje navê wî cihê “Cem Cihû” rûbarê “Yehûd” an ku cihê pevçûnê ye. Mîr îdê biryarê dide ku ew cihe taybet bi cihê Yehûdan e û nabe ti Kurdek an jî ti Bisilmanek biçe wir û mûdaxilê di wî cihê de bike”.

Piştî ku Bedirxan beg, di sala 1835’an de rewşa xwe ya leşkerî, siyasî û aboriya civakî bihêz dike, hêdî hêdî wek dewletek serbixwe xwe bi rêxistin dike. Cizîra Botanê wekî paytexta mîratiya xwe îlan dike. Di sala 1838’an de Mîr Bedirxan ji bo têkşikandina desthilata “Seîd Beg” alîkariya Osmaniyan kir. Wê demê Sultanê Osmaniya pileya “Emîdî Kolonêl” da Mîr Bedirxan. Herwisa Mîr Bedirxan di sala 1839’î de jî, digel Spaha Osmaniyan beşdarî

»»» Doma R:5

li şerê dijî Spaha “Êbrahîm Mihemed Elî” kir û ew şere li “Tirêb” nêzî “Entabiya” rû da.

Mîr Bedirxan, di sala 1839`an de bi mîrên Kurdîstanê re ket hundirê hevkarîya pîroz. Ji herêma Wanê Mahmût Xan, ji herêma Hekarî Nûrullah û Fetah Beg, ji serokên Hîzanê Xalid Beg, ji Mûşê Şerîf Beg, ji Qers û Acarê Husên Begê Kor, Mîrê herêma Erdelan, Şêx Mihemedê Mûsilî û Şêx Yûsifê Zaxoyî wek alimên mezin beşdariya wê hevpeymanîya pîroz bûn. Deşt bi xurtkirina kel û burcekan kirin. Mîrên Kurdîstanê yên hevkar, ji bo paraştina dewleta Kurdî, bi hev re sund xwarin.

Gelek ji dîroknivîs û lêkoler bi Mîr re dibêjin: “Bavê tevgera netewa Kurd” û gelek jî dibêjin “Serkirdeyê mezin ê leşkerî”.

“Kirîs Munşara” gotiye: “Mîr Bedirxan, qehremanê tevgera rizgariya Kurdîstanê bû di sedeya 19`an de”.

Li 26-17- 1847`î dewleta Osmaniyan bi merema jînavbirina mîrnişîniya Botan, hêzeke mezin a Osmaniyan ku Sultan amade kiribû, ew hêze pêkhatibû ji: “30 hezar leşkerê nîzamî û 15000 bikirîgîtî û 40 top”. Merema wan eve bû ku bi wê hêze dawî bi deştilata mîr Bedirxan bînin. Bi vî awayî Osmaniyan êrîşê ser spaha Kurdan li nêzî bajarê Urmiyê kirin û şer û pevçûneke mezin qewimî. Lê Spaha Osmaniyan nekarîn serbikevin û ji çendîn alîyan ve raştî şikestê hatin, Spaha Kuerdan jî berevaniyeke baş kirin, Spaha mîr Bedirxan çendîn topên Osmaniyan bi deşt xistin, lê nedizanîn bi awayekî baş wan bikar bînin. Ser wê halê de jî nexweşiya “Kolêra” ketibû nava hêzên Kurdan û hejmareke zaf bi wê nexweşiyê canê xwe ji deşt dan.



Piştî wî şerî, Bedirxan gava herî girîng avêt û serxwebûn îlan kir. Sînorê deşthelatîya Bedirxan gihîşt sînorê Wan, Mehabat, Rewanduz û Mûsilê. Piştî Wêranşar, Sorek, Amed, Şîno, Sêrt, Sincar, Aşna û Urmiye jî tevî sînorê xwe kir.

Bi wî awayî deştilatdarên Tirkî çendîn rê girtine ber xwe ji bo ku zal bin bi ser leşkerên Kurdan de. Serkirdeyên Tirkî li “Erzîrûm”ê jî rêya “Mela Mehmûd Bayezîd” ve civîn digel Mîr Bedirxan pêk anîn. Lê pêş vê ku Mela Mehmûd bizavire, Osmaniyan êrîş kirine ser bajarê Cizîrê. Mela Mehmûd zivirî bal paşayê Osmaniyan lê paşa ew girt û bo girtîgeha bajarê Stenbolê veguhastin. Û nameyek jî bo sultan nivîsî û tede gotibû “ew mirove hevalbendê Mîr Bedirxan” e û îxanet bi împratoriya Osmaniyan kiriye, bo vê ku baş li meselê tê bigin mela Mehmûd veguhastin bo bajarê Wanê.

Bi her nirxekî bû dewleta Osmaniyan karî hindek ji serkirdeyên Kurd ji aliyên xwe ve rabikêşin da ku di dawiyê de karîna “Yezdan Şêr” ku kesî nêzîk Bedirxan beg bû ku serkirtayetiya hêzeke mezin a mîrnişîniya Botan dikir, bajarê Cizîrê paytexta mîrnişîniya Bota teslîmê leşkerê Osmaniyan kir ku eva jî bû sedema wê ku morala şervanên Kurd bê xwarê ku di wî bajarî de kargeha çek û teqemenî tede bû.

Bi vî awayî leşkerê Osmaniyan bajarê Cizîrê wîran kirin û Mîr Bedirxan bi hêzeke mezin ve çû kela “Arox”, di wir de jî Mîr Bedirxan digel leşkerên xwe şereke qehrimanane kir û leşkerê Osmaniyan kel dorpêç kirin û mîr piştî şereke mezin ku teqemeniya wan hêdî hêdî dawî pê dihat, mixabin piştî çend rojan şer û pevçûn di dawiyê de li 12-8-1847`î mîr teslîmê Osmaniyan bû. Mîr Bedirxan dema ku birine Stenbolê bo cem Sultan û piştî çend car dadgehîkirin ew ji aliyê Sultanê Osmanî ve hate efûkirin û ji wir bo dorgeha “Kirît” a Yûnanê hate dîrxistin. Mîr Bedirxan ew karesate ya herîfina mîrnişîniya Botan ji bîr nekir ku ji rêya nêzîktirîn kesê wî ve xiyaret ji wî hatibû kirin.

Lê sedema xiyaneta “Yezdan Şêr” çi bû?

Ka em bizanin çima Yezdan Şêr kesekî nêzî Mîr Bedirxan xiyaret kir. Sedema xiyaneta “Yezdan Şêr” eve bû: “Dema ku Osmaniyan êrîşê ser kela “Kornîl” a “Seîd Beg” kirin wê demê Mîr Bedirxan piştgîriya Osmaniyan kir bo deştbiserdagirtina kelê. Çimkî “Seîd Beg” xalê “Yezdan Şêr” bû. Herwisa hepsîkirina “Mîr Siyfedîn” ev çend sedemane û çendîn sedemên din bûn ku “Yezdan Şêr” xiyaret bi Mîr Bedirxan kir. Piştî dagîrkirin û tîkşikandina mîrnişîniya Botan ji aliyê Osmaniyan ve, wê demê Osmaniyan gelek mal wêran kirin û sedan kes kuştin û gelek kes jî li deverên wan dîrxistin bo deverên din û herwisa deşt bi ser mal û zeviyên xelkê wê deverê de gitin, û ew zevî bi erzantirîn nîrx difiro-tine bîhaniyan.

Mîr Bedirxan piştî midehekê ku li dorgeha “Kirît” a Yûnanê bû, di sala 1858`î de Sultanê Osmanî biryara efûkirinê bo Bedirxan derkir, û Bedirxan jî piştî midehekê zivirî Stenbolê û li wir jiya, lê her dîsan demek ser de derbas bû Mîr Bedirxan Sitenbol bi cih hêla û ber bi Şamê ve çû. Mîr Bedirxan heya dawîya jiyana xwe di Şamê de jiya û di sala 1869`î de bo hertimî navê xwe yê zîrîn hîla nava dîrokê de û çû ber rehma Xwedê. Termê mîr li taxa “Rukine Dîn” a Şamê di nav gorîstana “Mulana Şêx Xalîd Neqîşbendî” de bi axê hatiye spartin. Belkî Mîr Bedirxan çû ser dilovaniya xwe, lê wî nîfşeke baş li pey xwe bi cih hêla, wî dadperwerî, yeksanî û vekhevî li pey xwe bi cih hêla, wî navê devera Botan wekî devereke welatparêz û Kurdperwer di nav dîroka Kurdan de tomar kir. Mîr Bedirxan û malbata wî, Îro rojê her kes dizane ku gelek alîkarî û xizmet di warê çand, dîrok, wêje û zimanê Kurdî de kirine, û bandora xizmetkariya wan, li her çar parçeyên Kurdîstanê belav bû, herwiha li Rojhilata Navîn û dewletên Ewropayê jî deng dan, û ketine nav rûpelên dîroka cîhanê û bi taybet di nav Dîroka Kurdan.

Nerîna Lîderan



“Ned Price”:

“Ew raporên ku basa vê yekê kirine ku Amerîka bo nîşandana niyazpakiya xwe li hember Tehranê dê pareyê bilokkirî bide Îranê, şaş in û nerast in”.




“Jean-Yves Le Drian”:

“Komara Îslamî piştî kimkirina sozên xwe ti carî ev hinde li çeka navkî nêzik nebûye”.



“Antony Blinken”:

“Komara Îslamî çend hefte maye bigihe bi çeka navkî”.



“Elî Şîrazî”:

“Spaha Pasdaran dikare Îsraîlê digel axê bike yek”.

Di roja cîhanî ya Azadiya Nerînan de ragihandina Rojhilat hêj her di nav sînoran de ye!



N: Eskender Ceiferî

Roja 3ê Gulanê, roja cîhanî ya Azadiya Nerînan, derbas bû lê rengê nû ji bo azadîx-wazên Îranê tê de nebû.

Dayîn û standina zanyariyan li Îranê û Kurdiştana Rojhilat, kontrolkirî û qedexe ne. Rejîma faşîstên Tehranê ya di bin siya axundên Cemarane de jî weke rejîma şayê Farsan, her û her azadiya welatiyan û nerînan kontrol dike.

Dibe ku rojnanevanek ji ber belavkirina nûçeya girtina kesekî yan jî zanyariyên li ser darvekirina kesekî, bi salan bê girtin. Li wir filtêra zanyariyan heye ku divê di berjewendiya hikûmetê de bin. Li gor benda 12 ya Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve di 10'ê berfanbara 1948'an de hate pejirandin, ti kesek nabe ji ber sedemên weke jiyana arizî, malbat xanî an jî ragihandinê, rastî ziyanê bê. Îran jî, yek ji wajokerên wê danezanê ye, lê belê ti xaleke wê bicî nake.

Li wî welatî, qet ne Zertiştîyan ne Behayîyan û ne jî Yarsanan mafê derxistina tenê belavokekê jî nîn in. Rejîm, hem van kîmîneyan û hem jî kîmîneyên ku di yasaya bîngêhîn a rejîma Îranê de navê wan hatiye, ditepisîne û bi merca ku zanyariyên wan di berjewendiya rejîmê de bin, rê didin wan weşanê bikin.

Ev jî yasayên exlaq û azadiyan bînpê dike ku li gora wê, Mafê her kesî yê azadiya ji bo raman, wijdan û olê heye. Eger jî di asta cîhanî de tê gotin ku Mafê her mirovî heye ku bi serbestî beşdarî li jiyana çandî ya civakî bike, lê li Îranê eger ew mirov



girêdayî ola Îslamê nebe, jê re pir dijwar çê dibe ku beşdarî karûbarên ragihandinî bibe.

Li gora benda 731 ya Yasaya Cezayên Îslamî li Îranê, her rojname, malper yan ragihandinek ku zanyariyeke lidijî hikûmetê belav bike û partî û aliyên dijberên Komara Îslamî bikarin lidijî hikûmetê mifahê ji wan zanyariyan biştînin, wê demê ew malper yan sazî tê cezakirin ku wan zanyariyan belav dike. Kesê ku bi vê tometê tê darezandin bi dayîna pere ji şeş milyon Tumenan heta çendîn salan girtinê tê cezakirin. Herwisa bendên 747 û 748'an yên yasaya navbirî, amaje dike ku eger kesê tometbar bi belavkirina zanyariyên lidijî hikûmetê, karmendê dewletê be, dibe ku tevî dîrxistina wî ji kar, rastî girtinê yan jî derbeyên qamçiyê bê.

Tevahiya saziyên ragihandinê yên çapkirî li Îranê, çî yên dewletê û çî jî yên dervey deştîlatê, divê derfeta çalakiyê ji wezareta Çanda Îslamî biştînin. Ew di dema standina derfetê de hin belgeyan îmze dikin ku tê de amaje dike daxwazker nabe ti çalakiyekê lidijî hikûmetê encam bidin ku bikare di berjewendiya partiyên dijber de be.

Li Îranê û li Kurdiştana Rojhilat jî, tenê dewlet dikare xwedîya televîzyonan be. Xelk yan xwediyên sermayeyan jî dikarin çend demjimêran ji bo programekê ji xwe re bikin. Lê mafê wan yê avakirina TV û radyoyan tine ye. Ew tenê dikarin belavokan bi wergirtina derfetê ji dewletê çap bikin.

Mehdî Kerûbî berendamê

serokkomariya çend gerran beriya niha, Elî Muteherî parlamenter û hin kesên din dixwaştin derfeta avakirina radyo û televîzyonê biştînin. Lê tevahiya wan daxwaziyan hatine redkirin. Sedem jî ev e ku rêveberiya saziya televîzyona wî welatî ku weke Deng û Rengê rejîma faşîstên Tehranê tê binavkirin, di bin çavdêriya raasteraşt ya Elî Xamineyî rêberê rejîma Komara Îslamî de ye. Bi vî rengî jî li Îranê û Kurdiştana Rojhilat, tenê Xamineyî xwediyê radyo û televîzyonan e.

Rejîmê vi hemû şiyana xwe, hêza xwe ji bo jinavbirina dengên nerazî bi kar anîye û weke çanda ku Xumeynî avakerê rejîmê ji wan re daniye, ew jî her û her di vê rêbazê de berdewam in.

Ew ragihandinkar û rojnameyên ku li gora yasaya wan, bînpêkarî encam dane, di yek ji van sê dadgehan de dikarin bêne dadgehîkirin: Eger rêveberên saziyan li hemberî wan gilî kiribin, li Dadgeha Çapemeniyê tene darezandin. Eger li gora ku ew dibêjin, ewlehiya netewî aloz kiribe, li Dadgeha Çand û Ragihandinê tene darezandin. Eger jî Rûhulla Xumeynî avakerê rejîma Komara Îslamî yan jî Elî Xamineyî rêberê niha yê vê rejîma gemar rexne kiribin, li Dadgeha Şoreşa Îslamî tene darezandin. Sedem jî ew e ku mafê kesî nîn e wan du kesan rexne bike.

Bi kurtî, li wir take mafê azadiya nerînan, ji bo rejîmê ye ku dikare li dijî dijberên xwe her tiştî bêje. Lê ti dengê cuda, nikare di hemberî rejîmê de bilind be.

Qamişlo û destpêka rêkeftineke Rûsî-Amerîkî



N: Ebdulazîz Qasim

Di roja 20'ê nîsana borî de û ji encama êrîşeke çeteyên bi navê Berevaniya Niştîmanî “Dîfa’h Wetenî” li ser rêbendek ji yên Asayîşa Rêveberiya Xweser li bajarê Qamişlo, şerek di navbera çeteyên Dîfa’h Wetenî û HSD de peyda bû, ev şer piştî kontrolkirina taxa Teyî li bajarê Qamişlo ji aliyê HSD ve bi dawî hat, û agirbeşteke “nezelal” bi navbeyinkariya Rûsyayê hate ragihandin.

Şer piştî sê rojan bidawî hat, lê hin jî sedemên serekî nehatine zanîn û heta ku hin çavdêr û şirovekarên siyasî vî yekê wekî “şanoyekî” li qelem didin û niha Rûsya berdewam ji bo peydabûna rêkeftineke nû kar dike ji bo belavkirina hin xalên asayîşa rejîmê li taxên nêzîkî firokxaneta Qamişlo, lê heta niha tiştek bi zelalî nehatiye ragihandin, herwiha sedemên sereke yên vî şerî ji nehatine aşkerekirin, ku bi xwe ve gelek pirsên bê bersiv digire nemaze ku ev çend salên Qamişlo hatiye dabeşkirin di navbera hêzên HSD, Rejîm û çeteyên Dîfa’h Wetenî û hêzên Sotoro yên Xirîştîyanî de.

Çete û milîsên Dîfa’h Wetenî, wekî destpêk di sala 2004’an de piştî serhildana Qamişlo ji aliyê hozeke erebî ve bi navê aşîra Teya hat damezrandin, wekî hêzeke çekdar û palpişt ji bo hêzên rejîmê ji bo serkutkirina xwepêşanderên kurd, herwiha ku piştî krîza Sûriyê di sala 2011’an, li gelek bajarên ev komên çeteyan hatin demzrandin û di nav de bi taybetî li Qamişlo û Hesekê, ku wan serborek herî xereb heye di karên xirab de wekî



dizî, talankirin û herwisa bazirganiya tiryak û kereştayên hoşber û hd.

Li aliyekî din şerê Qamişlo, ji aliyê gelek şirovekarên siyasî ve, wekî pilanekî ji aliyê rejîmê ve û bi pirsê helbijartinên serokatîyê ve tê girêdan, herwisa wekî pilanekî ji bo peydakirina şerekî kurdî-Erebî, û bi dîtina min tevî heta radeyekî dibe tiştek wisa hebe bi taybetî piştî zêdebûna gotara Erebî ya şofînzîm li dijî diyaloga Kurdî-Kurdî, û herwisa diyaloga Kurdan digel hin hêzên Erebî û Xirîştîyanan çî ji aliyê ENKSê û çî yên ji aliyê PYDê ve dibin, lê zêdetir wisa bi dîtina min dibe ku sedemên şerê Qamişlo girêdayî be bi sedema girêdana van komên çete bi milîs û pasdarên Îranê ve, nemaze ku di salên borî de çend hevdîtin di navbera hin serokaşîrên Ereban û serkirdeyên Dîfa’h Wetenî û Qasim Sûlêmanî û Hişda Şe’hbî de hatin lidarxistin, û dibe heta radeyekî pêwendîya wê bi êrîşên vê dawiyê yên li ser Herêma Kurdistanê û bi taybetî êrîşên li ser firokxaneya Hewlêr jî hebe?.

Dîsa tişta vê boçûnê piştrast dike, ku derxistina çeteyên Dîfa’h Wetenî ji taxên Qamişlo bi glopa kesik ya Amerîka hate encamdan, herwisa bi rezamendiya Rûsyayê jî ku îro dixwaze cihê rejîma Sûriyê bi temamî bigire, piştî ku rejîm niha gelekî lawaz bûye û dezgehên wê yên serbazî û ewlehiyê li ser Îranê û Rûsyayê hatine dabeşkirin, û Rûsya bi hemû hewlên xwe ji bo kêmkirina rola Îranê di nav xaka Sûriyê de kar dike, ji ber vê yekê dibînim ku di şerê Qamişlo de, renga rêkeftinek yan renga nêzîkbûnek di navbera Amerîka û Rûsya de peyda bû, ku divê Qamişlo aram be û ev yek wê bibe faktor ji bo serxistina diyaloga Kurdî-kurdî jî ya ku dibe ku piştî Cejna Rojiyê careke din destpê bike, tevî tê çaverêkirin ku dibe ev gera nû ya diyalog û danuştandinan gelekî kurt û cidî be.




Kolberekî Kurd bi sedema teqîna mîn li ser sînore bajarê Newûdê birîndar bû

Roja Pêşemî 16`ê Banemerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Nadir Sabirî”, yê kurê “Biraxas” ê xelkê gundê “Tîleko”, runîştîyê bajarê “Kamîyaran”ê, li ser sînore bajarê “Newsûd”ê bi sedema teqîna mîn birîndar bû.

Ew kolbere di dema kolberiyê de piyeke wî ketibû ser mînê û ji aliyê piştî piyê wî ve bi dijvar birîndar bûye.

“Nadir Sabirî” bo tedawiya pizîşkî bo yek ji navendên dermanî, hatiye veguhestin.

Li vê derheqê de, roja Çarşemî 15`ê Banemerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Mesûd Mihemedî”, xelkê gundê “Nenor”ê ser bi bajarê “Bane” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînore wî bajarî, hatibû birîndarkirin.




Guleştwanekî bajarê Kirmanşanê bi sedema qutbûna demareke laşê wî, canê xwe ji dest da

Werzîşvanekî temen 21 salî xelkê bajarê Kirmanşanê bi navê “Elî Dîlfanî”, guleştvan û endamê tîma netewî ya “Nebihîz”a Îranê, di dema rahênana guleştê de, bi sedema qutbûna demareke laşê wî, canê xwe ji dest da.

Ew wezîşvanê Kurd ku xwe bo kêbirkêya cîhanî ya guleştê li welatê Turkiye amade dîkir, di dema rahênanê de li tîmeke taybet li bajarê “Sehne” ya ser bi parêzgeha Kirmanşanê, raştî qutbûna demara ştu hatibû.

“Elî Dîlfanî”, piştî 10 rojan hewla pizîşkên nexweşxaneyê Taliqanî li bajarê Kirmanşanê bona çaserkirina pîrsgirêka vî, li roja Sêşemî 14`ê Banemerê, cane xwe ji dest de.

Cihgirê Geşepêdana werzîş li “Îdareya Giştî ya Werzîş û Cîwanên li Parêzgeha Kirmanşanê di vê derheqê de got: “Pêka rewşa koronayê li parêzgeha Kirmanşanê, ti tîmeke werzîşî mafê çalakvanîyê nebûye, lê berwajiyê biryara ştada parêzgehê, ew çalakvaniye bi rê ve çuye.



Kolberekî Kurd li ser sînore bajarê Banê hate birîndar kirin



Roja Çarşemî 15`ê Banemerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Mesûd Mihemedî”, xelkê gundê “Nenor” a ser bi bajarê “Banê” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînore wî bajarî, hate birîndarkirin.

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, bi bê agehdar kirina berê ‘biawayekî raşterast ev kolberê Kurd dane ber gulleyan.

“Mesûd Mihemedî” bo tedawiya pizîşkî bo yek ji navendên dermanî yên bajarê Banê hatiye veguhestin.

Li bajarê Urmiyê welatîyeka Kurd agir berda xwe



Welatîyeka Kurd a bi navê “Fetîme Elîpûr” a keça Osman û xelkê Gundê “Kanî Reş”ê ser bi devera “Soma û Biradoşt” a bajarê Urmiyê, xwe şewitand û dawî bi jiyana xwe anîye.

Ew welatîya, 6 rojan berî niha ku digel hevjinê xwe pîrsgirêka malbatî hebûye, agir berdabû xwe û xwe şewitandibû.

Ew jin piştî 6 rojan razandin li nexweşxaneyêke bjarê Urmiyê de, bi sedema kûrahiya birînan, canê xwe ji dest da.

Termê wê welatîyê, li roja Dûşemî 13`ê Banemer, li gundê “Kanî Reş”êbi axê spartin.

Navê dayika Yaşar Kemal Nûbar bû yan Nîgar bû?



N: Seîd Veroj

Dayik (dê) û bavê Yaşar Kemal, li gundê Ernîsa bajarê Wanê hatine dinê. Ernîs, nêzikê çiyayê Sîpanê bi alîyê Rojhelatê Bakur ve li perava Behra Wanê ye û gundekî li ser navçeya Muradîyê ye. Li gor daxuyanî û agahîyên resmî (fermî) navê dayika wî Nîgar e û yê bavê wî jî Sadiq e. Bavê Yaşar Kemal ji eşîra Luvan e û dayika wî jî ji eşîra Kizikan e. Wê demê serokê eşîra Luvan Gulîxan Begê apê Sadiq bû. Cîyê niştêcîbûna eşîra Kizikan li ser sînorê Tirkîye-Îranê ye, beşekî wan di nav Tirkîyê de dimînin û beşên din jî di nav sînorên Îranê de bi cî bûne.

Wekî bi deh hezaran malbatên kurdên wê herêmê, mala wan jî sala 1915an ji ber şer û êrişên Rusya Qeyserî, ji bêgavîyê terka cî û warê bav û kalen xwe kirîye. Ji peravên Behra Wanê berê xwe daye ber bi Rojava ve; pêşîyê ji gund çûne Wanê, dibînin ku ev bajarê qedîm giştî vala bûye. Malbat hemû bi hev re hefteyek li ber qela Wanê derbas dîke û ji wê derê ve berê xwe daye Dîyarbekirê. Gulîxan Begê serokê eşîrê jî di nav de, beşekî wan li Dîyarbekirê mane û yên din rê û koça xwe kûdandine, pêda çûne û di sal û nîvekê de gihaştine herêma Klîkya (Deşta Çîqur), bi wergera tirkî dibêjin “Çıkurova” û li gundê Hemîteya navçeya Qadirlîya bajarê Edenê bi cî bûne.

Yaşar Kemal, di payîza sala 1923an de li gundê Hemîteya qeza Qadirlîyê ji dayik bûye. Yaşar, bi çîrok, efsane û kilamên dengbêjê malbatê, Evdalê Musa mezin bûye; kilamên wî yên li ser Evdalê Zeynikê û Sîyabend û Xecê



yên herî meşhur bûn. (Bitikîne: <https://youtu.be/qKee8gYnNUA>) Yaşar dema ku çar salî bûye, bavê wî hatiye kuştin. Salên bavê wî ji yê dayika wî gelek zêdetir bûne. Piştî mirina bavê wî, Nûbar Xanima dayika wî li ser apê wî yê Tahir Beg mehr kirine.

Yaşar Kemal dibêje: “Tiştê ku ez li ser malbatê dibêjim pirranîya wan ji mezinan û bi taybetî jî ji dayika xwe hîn bûme. Hafîza dayika min gelek xurt bû, hîç tiştêkî ji bîr nedikir. Dayika min gelek xweş dipeyivî lê mixabin tirkîya wê kêmbû. Ew ji çîrokbêjekî(ê) xweştir bi kurdî dipeyivî. Dema ku wê çîrokek, deştanek bigota û behsa bûyerekê bikira, ji ber vegotina wê her kes lal û ebkem dibû. Ez jî heyranê vegotina wê bûm û gotinên wê gelek tesîr li min dikir. Demeke dirêj ez ji peyivîna kurdî dûr ketim, bi tevî ewqas dûrmayînê, ger îro jî hinek bi kurdî peyivîn û têgihîştina min hebe, ew ji ber dayika min e.”[1] Li gor agahîyên biyografîk ên li ser Yaşar Kemal, navê dayika wî “Nîgar” bûye.

Li gor agahîya Cavît Benlidayî yê nevîyê Elî Îlmî Fanîzade yê xwedîyê rojnameya Ferda, dema ku mala Yaşar Kemal li Qadirlîyê bûye, ew cîranê mala Elî Îlmî Fanî bûne, doştanîya wan hebûye, daîm çûn û hatina wan çêbûye. Elî Îlmî Fanî, bi tevî birayên xwe yên Zeynelabidîn û Mesûd Fanî, endamên Cemîyeta Tealîya Kurdistanê bûn. Ji ber xebata wan a mixalîf, navê her sê birayna jî ketibû nav lîsteya sirgûnên 150an û hatibûn derkirin ji nav sînorên Tirkîyê. Ew, bi tevî derçûna efûya 29ê Hezîrana 1938an vegerîyabû war û bajarê xwe yê Qadirlîyê. Cavît Benlidayî dibêje: Navê dayika Yaşar Kemal “Nûbar” bû, me ji wê re digot “Nûbar Bîbî”[2]. Ev wêneyê Nûbar Xanima dayika Yaşar Kemal jî, di arşîva Cavît Benlidayî de hatiye dîtin û ji alîyê wî ve di 9ê Hezîran 2018an de li ser bloka “Kadrlînin Eski Fotoğrafları” hatiye belavkirin. Ev têkilîya malbatî ya edîb, şair û rojnamevanekî navdarê ê wekî Elî Îlmî û aîleya Yaşar Kemal, îhtimaleke din jî tîne bîra me; mimkûn e ku yek ji paşxan û çavkanîya nivîskarî û edîbîya Yaşar Kemal jî, Elî Îlmî bi xwe bûye.

[1] Alain Bosquet ile Görüşmeler, Yaşar Kemal Kendini Anlatıyor, YKY, 1992

[2] <https://www.facebook.com/groups/552099351644345/permalink/935474453306831>



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Welatîyekî xelkê bajarê Mihabadê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Înê 10`ê Banemer, welatîyekî Kurd bi navê “Sîrûs Mewlûdî”, kurê Îsmâîl û xelkê bajarê Mihabadê li bajarê Şîrazê de, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ew welatîyê Kurd binçav kirin û bo lêkolînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Şîrazê veguhaştin.

Hêzên ewlehî, bi malbata Sîrûs re ragihandine ku navbirî bi tohmata Siyasî, hatiye binçavkirin.

“Sîrûs Mewlûdî”, di heyamê binçavkirina xwe de, ji “deştêpêregihîştina bi parêzer” û “çavpêkevtina digel malbata xwe” bêpar kirine.

Heta dema belav bûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û sûçê ku bi ser wî welatîyê Kurd de hatiye sepandin ti zaniyarek ji ber deşt nîne.

Du welatîyên Kurd piştî bi dawî hatina jêpîrsînê bo girtîgeha Urmîyê hatine veguhaştin

Roja Dûşemî 13`ê Banemerê, du welatîyên Kurd ên bi navên “Xalid Îsmâ`îlî” xelkê bajarê “Nexede” û “Nadîr Mêhrî” xelkê bajarê “Urmîyê”, piştî bi dawîhatina jêpîrsînê ji girtîgeha Îdareya Îtla`ata Urmîyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatine veguhaştin.

Ew du welatîyên Kurd ku niha li benda girtiyên siyasî li girtîgeha navendî ya bajarê Urmîyê de ne, di heyama binçavkirinê de li “Deştêpêragiheştin bi parêzer û Hevdîtin digel malbata xwe” bêpar bûne.

Tohmata ku bi ser wan 2 welatîyên kurd de hatine sepandin “endambûn li yek ji girûpên Olî” de ye.

Ew du welatîyên Kurd li roja Înê 27`ê Xakelêwe, bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo jêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê hatibûne veguhaştin.

Li Merîwanê 4 welatî hatine binçavkirin

Şeva Dûşemî 13`ê Banemerê, 4 welatîyên Kurd ên bi navên “Kejwan Feyzî, Fuad Feyzî, Şêrko Suhrabî û Ako Çawgî” ên xelkê taxa “Daseyran”a bajarê Merîwanê, hatine binçavkirin.

Ew 4 welatîye, piştî vê yekê ku wan nerizayetiya xwe li hemberî manora selefîyên tundajo nîşan dabûn, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo cihekî nexûya hatine veguhaştin.

Şeva Şemî 11`ê Banemerê, selefîyên tundajo li taxa “Daseyran”ê êrîşî li ser malên wan 4 welatîyan kiribûn û du kes jî birîndar kiribûn.

Aran Tîbaş ji girtîgeha bajarê Urmîyê çû bo murexesiye

Roja Yekşemî 12`ê Banemer, girtiyê siyasî yê Kurd “Aran (Mecîd) Tîbaş”, û xelkê gundê “Dize” yê ser bi devera “Mirgever” ji girtîgeha bajarê Urmîyê çû bo murexesiye.

Ew girtiyê siyasî di heyama binçavkirina xwe de bo yekem car hate murexesiye û berê Dadverê Çavdêr yê girtîgehê digel daxwaza navbirî bo murexesiye dijatî kiribû.

Berê jî, taya 9 a cîbicîkirina cezayên dadgeha şoreş ya bajarê Urmîyê digel daxwaza azadiya bê merc a wî girtiyê siyasî dijatî kiribû.

Li roja Duşemî 17`ê Pûşpera sala 1398`an de, ew welatîyê Kurd ji aliyê karbideştên dadweriyê ve hatibû binçavkirin û bo derbaskirina heyama cezayên xwe bo girtîgeha bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Li meha Reşeme ya sala 1397`an de, ew ciwanê Kurd li taya 3 a dadgeha şoreş ya bajarê Urmîyê, bi serokayetiya dadver “Necefî”, hate dadgehîkirin û bi tohmata “endambûn û propagende bo yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” bi 5 sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Piştî nerizayetînişandana navbirî bi hukmê dadgeha deştêpêkî, ew cezaye di dadgeha pêdaçûnê de bi 4 sal girtîgehê hatibû kêmkirin.

Roja Pêncşemî 27`ê Befranbara sala 1397`an de, “Aran (Mecîd) Tîbaş” piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê, bi awayekî demkî heta bi dawîhatina qunaxên dadwriyê, hatibû azadkirin.

Ew ciwanê Kurd li 5`ê Befranbara heman salê de bi tohmata “peywendî digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” bo “Stada Xeberî” ya îdareya Îtla`ata bajarê Urmîyê hatibû gazîkirin û piştî hatibû binçavkirin.

Li Sala 1391`an de, ew ciwanê Kurd pêka biryara paraştina zanîngeha “Êlmî – Karbordî” ya bajarê Urmîyê ve, bi sedem ku li ser şaşeya laptapa wî wêneya alaya Kurdistanê hebû û di kombûna zaniştî de li ser projektorê hatibû nîşandan, ji dersxwandinê hatibû bêparkirin.

Li Sala 1392`an de jî, ew ciwanê Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî hatibû azadkirin.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (397)

